# Jîn

Jimara dehê    Heyva Sibatê 2007    Vercinye, Emrîke    

Ev sale ev bîrhatina cejina şîkirna deyk u babêt min pêncî sala ser wan ra bûrî.



deyk u babêt min li roja şîkirnê, 1957

Her dû deyk u babêt min li mal yêt bawerîa ‘Îsayê Mesîḧ kir mezin bîn. Deyka min li mala xu nexirî ye u babê min biçîkê çarê ye. Êk u dû dîtin u nas kirin wextê li kûllîa Incîlê dixwandin.

Wextê mezin bî ne, malêt wan gelek feriq hebîn!

Babkalkêt deyka min Holendî u Îrelendî u Inglîzî bîn u ji mêj e (1650) miḧacir bîn bu Emrîke. Deyka min li bajêrêt zorr li Kelifornya Başur mezin bî u babê min li zevîek biçîk li Orgena Rojava mezin bî. Her dem babê deyka min timbêla nî kirrî u ‘ewil êk bî wextê televizîun kirrî. Hindek car mala wan çûn xwaringehê da bixwin.

Babkalkêt babê min Almanî bîn. Nêzîkî sala 1875 babê bapîrê wî bar kir bu Emrîke. Mala babê min li mal zimanê Almanî axift ḧeta ew u meta min çûn medresê, u paşî mala wan zimanê wan guhurrî u Inglîzî axift. Mala babê min feqîr bîn. Wî u xoşk u birayêt xu kêm cilik hebîn. Mala wan timbêlek kevin hajutin. Kêm çûn xwaringehê da bixwin.



deyk u babêt deyka min    deyk u babêt babê min

Her dû temenî deyk u babêt min bîst u êk sal bî wextê mehir kirin. Piştî dû sala Xwidê birayê min da, u piştî salek u nîv Xwidê xoşka min da, u dîmahîkê piştî dû sal u nîv Xwidê ez jî dam. ‘Ewilî babê min her dû şul kir u çû kûllîê u jiber hindê mala me xu bir gelek ciha. Paşî me mala xu bir Teksis u ḧeta nuke deyk u babêt min man li wêrê.

Wextê şî bi êk u dû kirin, deyk u babêt min ji berî Xwidê u miruvêt xu u hevalêt xu sînd xwarin u gut dê mînin li gel êk u dû ḧeta mirinê – heker dewlemend bin yan feqîr bin, heker seḧeta wan baş bit yan xirab bit. Ew rêzê li êk u dû digirin u digel ta’etî bu Xwidê dikin – bi bigiştî u bi tinê jî. Ḧeskirna wan gehiştî bî ye. Li gel êk u dû maîn wextê li demêt zeḧmet u demêt keyf u demêt feqîr u demêt baş. Seḧeta wan baş bî u dem jî hebîn wextê seḧeta wan nebaş bîn. Em sê biçîk xudan kirîn u xizmeta miruva gelek car kir.

Babê min her dem rêberek yê dînî baş bî. Her roj me pêk ve Incîl xwand u bu êk u dû u bu miruvêt dî du’a kirin.

**Roja Evînîê pîruz bit, Deyk u Bab!** Ser xêrê bit bu pêncî sal we ḧe ji êk u dû kirî ne u rêka Xwidê jî girtî ne! ☺

“Jîn” guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Azadîa rastî çi ye?

Çawa em li şîkirnê azadî ne? Heker em bi dîv zanînêt Xwidê bikevîn, ew hevalbendîe u ḧemî hevalbendîêt dî dirist in u azadî jê dî’êt. Erê zanînêt Xwidê çi ne?

Helbet Xwidê melîk e u serukê ḧemîa ye. U çunku Xwidê gelek ḧe ji me dikit, serukayetîa wî bu me ne zeḧmet e. Baş e em dişêîn xizmeta Xwidê bikîn.

Xwidê serukayetîê daî me li vî edrî u jî karêt barî daî miruva.

Zelam serukêt mala ne. Barê wan bu Xwidê eve ne: ḧe ji jinêt xu dikin, çavdêrîa biçîkêt xu dikin bi rengekî dîndar u bi zanînêt dîndar, u brîarêt zana bidin. Bila zelam ḧe ji jinêt xu bikin weku ḧe ji xu dikin!

Barê jina eve ye: qedirê mêrêt xu digirin weku zelama u weku seruka. Bila qedirê wan bigirin!

U barê biçîka eve ye: Bila her dem guhê xu bidin deyk u babêt xu!

Weku ḧemî awa ya serukayetî, Xwidê her seruke u dilsuze dimînit bu barêt wan u xwastinêt wan ji miruvêt dî. Xwidê barêt miruvêt dî (ye’nî jin u biçîk) radikit yêt qedir u guhdarîê serukêt wan. Helbet heker serukê te dixwazit tu tiştekî xirab yan gunnehbar bikî – u tiştekî Xwidê razî ne bit – bila we ne ke!

Hevalbendîêt mala jê bawer dikin bi hevalbendîêt her miruv li gel Xwidê. Sanahîtir e jinek qedirê mêrê xu bikit heker mêrê wê ḧe ji wê dikit u heker li jîana wî pîa Xwidê kirî ye. U sanahîtir e biçîk guhê xu didin deyk u babêt wan heker deyk u babêt wan pîa Xwidê kirî ne u pîa êk u dû kirî ne.

Erê çi lê ye jinberdan? Ez dizanim tijî Emrîkî berdaî ne u gelek car jinek dî înaî ne. Belê Xwidê husa bu me *ne* vêt. Gava ‘Îsa li ser ‘edrê bî, wî beḧsa berdanê husa kir:

> Ya hatî ye gutin, “Her kesê jina xu berdit, pêtivî ye bawernama berdanê biditê.” Belê ez dibêjime we her kesê jina xu ne ji ber dehmenpîsîê berdit, dibite egera hindê, ku ew jin bibite zinaker u her kesê jina berdaî bu xu bînit zinayê dikit.
>
> (Mizgînîa Mettî 5:31-32)

Hîvîdar im jinberdan giştî naête Kurdistan, u hîvîdar im zelam dê rêzê li jinêt xu girin u jin dê rêzê li mêrêt xu girin. Zelam, ḧe ji jinêt xu bikin! Jin, qedirê mêrêt xu bigirin! U husa hîn dê azadîa rastî bînin li şîkirnê.

**“Erê ma we ne xwandî ye, ku çêkirî <ji destpêkê nêr u mê çêkirin>? U gut, <Ji ber vê çendê zelam deyk u baba dê hêlit u dê her dû bine êk leş> u piştî hingê ne dû leş in, belê êk leş e. Vêca ew tiştê Xwidê girêdaî miruv jêk ve nakit.”** **- ‘Îsa (Mizgînîa Mettî 19:4-6)**

“Jîn” guvareke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Ra’ut u Bo’ez

### Kulib u Barkirin bu Erdê Muab

U li rojêt karbedestî ya qazîya birseka “Kulib” mezin kete dinav welatî da – u zelamek ji “Bêtleḧima” Yehudaî li erdê Muab li gel jina xu u herdû kurrêt xu barkirin. U navê wî zelamî “Elîmalk” bî u yê jina wî “Nu’mî” bî u herdû kurrêt wî, êk “Meḧlun” bî u yê dî “Kîlîun” bî. U ew Efratî bîn ji xelkê Bêtleḧima Yehuda bîn. U bu welatê Mu’ab barkirin u li wêrê akincî bîn. U Elîmalkê mêrê Nu’mî mir – u jina xu u herdû kurrêt xu hêlan. Ewêt dû kiçêt Muabî mehir kirîn. Navê êk ji wan “‘Urfe” bî u ya dî “Ra’ut” bî. U nêzîkî deh sala li wêrê man. U paşî Meḧlun u Kîlîun mirin. U husa jinik ma bê mêr u kurr u ma bi tinê.

### Nu’mî u Herdû Bîkêt Wê

U Nu’mî hêşta li Mu’ab bî. U guh lê bî ku Xudanî milletê xu yê pîruz kirî u erdê wan yê bi berhem êxistî. Îna ew herdû bîkêt xu rabîn u çûne welatê wê. U herdû bîkêt wê li gel wê çûn demê vegerrîaî bu Yehuda. U Nu’mî gute herdû bîkêt xu, “Her êk ji we herrin mala deyka xu u bila herweku we çakî li min u mêrêt xu yêt mirî kirîn – Xudan we pîruz bikit, bu bila Xudan we bi dû mêrêt dî yêt baş xelat kit.” U herdû maçîkirin. U ketine girîê – u bi dengekî bilind girîn. Belê wan gutê, “Ne, em dê li gel te ên milletê te.” Îna Nu’mî bersiv da, “Kiçêt min – hîn vegerrin – dê buçî li gel min ên? Ma ez dê şêm kurra bibim u da mezin bibin u bibine mêrêt we? Kiçêt min hîn vegerrin u herrin. Ez ya pîr bîm. U ez kêr hindê naîm bibim jina zelamek dî – u heta heker min bivêt ez ev şeve şî bikim u kurra jî bibim, hîn dê çaverîê kin heta mezin dibin? U ma hîn dê ji ber wan mînin neşîkirî? Ne kiçêt min, ez gelek ji ber we pusîdime, çunku Xudanî ez sizadam u zîan gehişte we jî.” U paşî careka dî jî bi dengekî bilind girîn – u ‘Urfê xesîa xu maçî kir u çû – belê Ra’ut ma li gel u jê ve ne bî.

### Ra’ut Birîarê didit li gel Xesîa xu Bimînit

Îna Nu’mî gutê, “Wa henê jintî ya te vegerrîa u gehişte milletê xu u xudayêt xu. U tu jî weku wê bike.”



Îna Ra’utê bersiva wê da, “Tu min tengav ne ke ku ez te bihêlim çunku tu kîve biçî, ez dê li gel te çim. U tu li kîve bimînî, ez dê li wêrê mînim – milletê te, milletê min e – u Xudayê te yê min e. Tu li kîve bimirî – ez dê li wêrê mirim u ême veşartin – u bila Xudan bi dijwartirîn sizaî min siza bidit heker ez te bihêlim – u ji mirinê pê ve çi tişt me jêk ve nakit.” U demê dîtî ewa sure li ser hindê u dê li gel çit. U êdî ji hindê rawesta ku wê qebîl bikit ku vegerrit. U bi rê ketin u heta gehiştîne Bêtleḧim u çawa gehiştîn u kes u karêt wê gelek beḧsa wê kirin u pisîara ji êk u dû dikirin, “Erê eve Nu’mî ye?” Îna gute wan, “Hîn ne bêjin min Nu’mî. Belê bêjin min “Murre” çunku Xudayê bi şîan jîana min yê teḧil kirî. Ez tijî derketim – u Xudanî ez dest vale vegerrîa ne dim. Vêca hîn dê buçî bêjine min Nu’mî u Xudanî ez rezîl kirim, u yê bi şîan ez bi bela êxistim?” U husa Nu’mî u bîka wê Ra’uta Muabî ji welatê Muab vegerrîan. U gehiştina wan bu Bêtleḧim li dest pêka demê durîna cehî bî.

### Ra’ut Gulîêt Genimî lêk didit

U Nu’mî miruvekî dewlemend u pişt gerim hebî. Ji huza Elîmalkî mêrê wê bî, navê wî “Bo’ez” bî. U Ra’uta Muabî gute Nu’mî, “Bihêle ez biçim çemî u gulîêt ji destê her kesekî ji min razî bit bikevit lêk dim.” Îna bersiva wê da, “Herre kiça min.” U çû çemekî u dest bi lêkdana gulîa li dîf pala kir.



© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Jîn



### Bo’ez Fermana Palêt xu dikit u Çakîê li Ra’utê bikin

U ew parçê çemî yê Ra’utê gulî jê lêkdidan derket çemî Bo’ezî ji huza Elîmalkî u Bo’ez ji Bêtleḧim hat. U gute pala, “Xudan li gel we bit.” Îna bersiv da, “Xudan te pîruz bikit.” U Bo’ezî pisîar ji xulamê xu kir ewê berpirsê pala, “Ev kiçka henê kî ye?” Ewî bersiv da, “Ew kiçeka Muabî ye ji welatê Muab li gel Nu’mî ya zivirrî.” U daxwaz kir u gut, “Bihêlin ez gulîêt ji piştîa dikevin lêk dim li dîf pala, u ewa her ji spêdê u heta vê gavê lêk didit. U bes piçekê bêhina xu ya li ber sih berê vedaî.”

### Axiftina Bo’ezî li gel Ra’utê



U Bo’ezî gute Ra’utê, “Guhê xu bide min kiça min – tu li vêrê bimîne gulîa lêk de u ne çe çi çemêt dî – u li gel melukdarêt min yêt jinik be u ji wan ve ne be. U çavê te li wî çemî bit ewî pale didurîn u li dîf wan herre u min yê gutî xulama kes çi xirabîê li te ne kin. U heker tu têhinî bî, herre ji wan amana vexu yêt ewan tijî kirîn.” U serê xu çemande erdî u gutê, “Çawa ez ketim cihê razîbîna te u ez bîanî?” U Bo’ezî bersiva wê da, “Gehişte min ew çakîa te li xesîa xu kirî piştî mirina mêrê te – u gehişte hindê te dî babêt xu u erdê deykbîna xu ḧemî hêlan. U tu hatî def milletekê bîanî u tu wan nas nakirî. Bila Xudan, Xudayê Îsraîlîya te pîruz bikit, ewê tu hatî xu li bin çengêt wî biparêzî, u bi gureî çakîa te li te bikit. U bila kirîa te ji def wî bit u bê kêmatî bit.” U gut, “Xwizîka ez her li cihê razîbîna Xudanê xu bam. U te dilê min xuş kir, u te dilê carî ya xu şad kir. U di ser hindê ra ez carîyek te bi tinê naînim.” U demê bî ye demê xwarinê, Bo’ezî gutê, “Were pêş u hindek nanî bixu, u parîê xu bike dinav me yê da.” U bi tenişt pala ve rînişt u hindek zad dayê u xwar u têr bî u jê zêde kir. U paşî rabî da gulîa lêk dit. U Bo’ezî fermana xulamêt xu kir u gut, “Bihêlin bila gulîa dinav bera bermilêt cehî jî lêk dit u çi lê ne kin. Belê hindek gulîa ji nav bermila jî derêxin u bila bu xu lêk dit u hîn wê tengav ne kin.”

### Bo’ez Miruvê Nu’mê ye

U Ra’utê heta êvarî gulî lêkdan – u paşî ew gulîêt lêkdaîn qutan u ew gulîye derketin “îfeyek” ji cehî (nêzîkî bîst u çar lêtira ji cehî) u helgirt u çû bajêrî. U çavê xesîa wê bi cehê wê kit u paşî ew xwarina ji wê zêde kirî îna derê u da xesîa xu. U ewê pisîar jê kir, “Evru te ji kîve lêkda? U te li kîşk çemî şul kir? Bila Xudan wî pîruz kit ewê diluvanî bi te birî.” U Ra’utê beḧsa wî miruvî kirîê li çemê wî şul kirî u gut, “Navê wî zelamê min li çemê wî şul kirî evru Bo’ez e.” U Nu’mî gute bîka xu, “Bila Xudan pîruz bit çunku ew çakîa xu ji sax u mirîa navegirt.” U paşî her gut, “Ew zelame miruvê me ye. U ew êk ji semîanêt me ye.” Ra’uta Muabî gut, “Daxwaz ji min kir ez li gel xulamêt wî bim heta ku durîna xu bi dîmahî diînit.” Îna Nu’mî gute Ra’utê bîka xu, “Bu te baş e tu li gel xudamêt wî bî. Heker te li çemek dî şul kir, ne weku zîanek bi gehite te.” U Ra’utê li gel kiçêt Bo’ezî şul kir. Ewêt îşî lêkdidan heta durîna genimî u ceha jî xilas bî ye. U li gel xesîa xu ma.

### Nu’mî ber Gerhanê dikit, Ra’utê bidit Şî

U rojekê Nu’mî gute bîka xu Ra’utê, “Te divêt ez bu te li mêrekê bigerrim u çavê xu bidit te u bikevî di xuşîa da? Mane Bo’ez ewê te li gel kiçêt wî şul kirî miruvê me ye? Ew dê ev şeve bêdera cehî dite baî. Vêca xu bişu u cuantirîn cilkêt xu bike ber xu u bêhina xuş li xu bike – u tu herre bêderê. U tu ne hêle tu li wêrê bibînit heta ji xwarin u vexwarina xu xilas bit. U demê dinivit – tu cihê nivistina wî bizane – u paşî herre def liḧêfa wî ji ser pêt wî rake – u li wêrê xu drêj bike. Ew dê nîşa te dit ka dê çi kî.” Îna bersiv da, “Heçîa te gutî ez dê kim.”

### Ra’ut Seredana Bo’ezî dikit

U Ra’ut çû bêderê u heçîa xesîa wê gutîê bi cih înat. U pîstî Bo’ezî xwarî u vexwarî u têr bî ye u çûî daku li kuşê dîmahîê ji kuma cehî binvit, Ra’ut ji dizî ve çû u li□êf ji ser pêt wî rakir u li wêrê nivist. U li nîva şevê zelamî xu wergêrra u têk çû u paş ji xew rabî u li xu zivirrî – u didîtina dîtî


© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

jinkek ya li def pêt wî nivistî ye. Pisîar kir, “Tu kî î?” Îna bersiv da, “Ez Ra’ut im xudama te me. Vêca tu li lêva kirasê xu bi xudama xu da bike çunku tu miruvê me î u semîan î.” Îna gut, “Bila Xudan te pîruz bikit kiça min, çunku ew çakîa te nuke dîar kirî ji ya berî nuke pitir e. Tu ne çûî def xurta, çi dewlemend bin u çi hejar bin. U vê gavê tu ne tirse kiça min. Ez dê heçîa tu dixwazî bu te kim. Xelkê bajêrê min hemî dizanin tu jineka berketî î. Rast e ez miruvê te me u semîan im, belê semîanek dî yê hey ji min nêzîktir e. Tu ev şeve binve. U li spêdê heker ewê ji min nêzîktir u heqtir bi xizmeta semîanîê rabî u tu mehir kirî, ew gelek baş e. U heker qebîl ne kir bi xizmeta semîanîê rabit, ez bi Xudanê sax sînd di xum dê te mehir kim. U tu vê gavê heta spêdê binve.”

### Bo’ez Cehî didit Ra’utê

U li def pêt wî heta spêdê nivist. U hêşta tarî gewirk rabî wesa tarî bî kesê hevalê xu nas ne kirî, gutê, “Ne bêje kesê tu ya hatî bêderê.” U herwesa gutê, “Ew qutkê li ser te bîne u bigire.” U ewê we kir. U şeş amanêt cehî bu kirne ser (nêzîkî sih u şeş lêtira). U danat ser milê wê u paşî çû bajêrî. U Ra’ut çû def xesîa xu u pisîar jê kir, “Çi çê bî kiça min?” U heçîa zelamî lê kirî gute xesîa xu. U gut, “U şeş amanêt cehî dane min u gut, “Dest vale ne çe def xesîa xu.” Îna Nu’mî gutê, “Xu bigire kiça min, heta em dîmahîê bizanîn çunku zelam narawestit heta ẖemîê bi dîmahî neînit.”

U Bo’ez çû gurebana dergehê bajêrî u li wêrê rînişt. U çi pê ve ne çû. U ew xizmê semîan di wêrê ra bûrî ewê Bo’ezî beẖs kirî u gutê, “Were vêrê ey heval u rîne.” U hate def u rînişt. U Bo’ezî gazî kir deh zelama ji rihspîêt bajêrî – u gute wan, “Li gel me li vêrê rînin.” U rîniştin. U paşî li semîanê xizim zivirrî u gut, “Nu’mî, ewa ji welatê Muab vegerrîaî, divêt parçê erdê miruvê me Elîmalkî bifruşit, u min gut ez dê bêjime te: çemî li def van zelamêt rîniştî bikirre u di ẖuzîra rihspîêt milletê min – vêca heker te bivêt xu jê bikirre u heker te ne vêt bêje min. Çunku di dîf te da min heq yê hey bikirrim.” Îna zelamî bersiva wî da, “Ez dê kirrim.” Îna Bo’ezî gut, “Roja tu erdî ji Nu’mî bikirrî, li ser te ewe tu Ra’uta Muabî mehir bikî daku tu navê mirî li ser mîratê wî sax bikî.” Îna semîanê ji hemîya nêzîktir gut, “Ez ne şêm çemî bikirrim. Heker min kirî dê mîratê xu pîç kim. Vêca tu pêş min ve çemî bikirre çunku ez ne şêm xu jê bikirrim.”

### Bo’ez Erdî dikirrit u Ra’utê Mehir dikit

U berê rewştê Îsraîlîya ew bî. Derbareî guhurînê u pêşvekirînê bu çespandina hemê ku zelam şimka xu bêxit u bidit bikirrî, daku kirrîn u firutin u guhurrîn bibit karekî desturî. U ew semîanê nêzîk gute Bo’ezî, “Bu xu bikirre” u şimka xu êxist. U Bo’ezî gute rihspîya u ew miruvêt li dura, “Hîn şahdin min hemî tiştê Elîmalkî u herdû kurrêt Kîlîunî u Meẖlunî heyn ji destê Nu’mê kirrîn. U herwesa Ra’uta Muabî jinka Meẖlunî min kirrî daku bibite jina min, daku navê mirî sax bikim li ser mîratê wî. U navê wî dinav birayêt wî da berze nabit u ji pertuka bajêrî naçit. U hîn evru şahdin li ser vê çendê.” U ew miruvêt li def dergehî bajêrî u rihspîya jî gutin, “Em şahdîn – bila jinka diête di mala te da weku “Raẖîlê” u “Lîê” bit, ewêt mala Ye’qubî avakirîn. U bila dwîndeha te dinav Efrate da zêde bit – u navê te dinav Bêtleẖim da belav bit.” U bila dwîndeha te, yaku Xudan ji vê jinkê didite te, temet dwîndeha Fares bit yaku Tamarî bu Yehudaî bî.” U Bo’ezî Ra’ut mehir kir u çû nivîna wê u kurrek jê bî. U jinka gute Nu’mî, “Bila Xudan pîruz bit ewê tu ji semîanî bê behir ne kirî evruke. U bila navê wî li Îsraîl belav bit çunku bîka te ewa he ji te kirî, bu te ji ẖeft kurra baştir e u ew biçîke îna daku bibit egera sax kirna deruna te u te li pîrîê Xudan bikit.” U Nu’mî kurrik kire di kuşa xu da u xudan kir. U cîranêt wê gutin, “Nu’mî kurrek bî” u navê wî kirin “‘Ubîd”. U ew babê “Yesî” ye babê Daûdê paşa ye.

### Deykbîna ‘Ubîdî, Bapîrê Daûdî

U eve ne dwîndeha Faresî:
Fares Ḧesirun ra da
  u Ḧesirunî Ram ra da
    u Ramî ‘Emîna ra da
      u ‘Emînaî Neẖşun ra da.
U Neẖşunî Selmun ra da
  u Selmunî Bo’ez ra da
    u Bo’ezî ‘Ubîd ra da
      u ‘Ubîdî Yesî ra da.
U Yesî Daûd ra da (ew pêẍember bî).

- Pertuka Ra’utê


© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Îmêlêt We

Helo. Ser salê te jî pîroz dikem. Daxaze ji Xwidê dikem hemî rojêt te cejinê ser salê bin. Rastî gelek keyfa min hat bu min, ev rojname hatî. Ez dê belaf kem bu hemî dezgeha u qotabxana virêkem. Supas carek dî. Bi xatra te!

R.B.

Çawan î baş î? Ez ji te xerîb bim.

Ez xwîndikarek li programa te bîm. Ez gelek ji te xerîb bim.

‘Ewilî Cejina Deykbîna ‘Îsayê pîruz bit! U serê salê pîruz bit! Piçek dreng e - bibure! Ez ferhenga te ya Înglîzî-Kurdî evîndar dibim. Ez dizanim pêtivî ye zeḧf şul u sebir hebit da ferhengek ecêbmaî husa binvîsî. U hêş ecêbmaî ye jinkek Emrîkî ev nivîsî.

Silava li mala xu bike.

A.A.B.

Çawan î Şirîn.

Jîana te u vîana te ecêbmaî ye u meztir e u ji te divêt. Keyfa min hat çunku tu hevaleka min î. Rast e vîanêt te qedirê Xwidê dikin u hîvîa Xwidê me vîanêt te dê ên. Min “Jîn” kapî kir da taze bixwînim.

Serê salê pîruz bit! Silametî ye bu babê te jiber ‘emelîata wî. Ez du’a dikim Xwidê yê hêz dê seḧeta wî çê bit.

T.X.

Mamosta Şirîn,

Supas bu virêkirna “Jîn” bu min. Karekê cuan e. Dest xuş!

X.

Cejina deykbîna ‘Îsayê pîruz bit! Serê salê pîruz bit!

Silav, Mamosta Şirîn. Ev rojname bi dilê min e. Ew gelek baş e bu jîana çêtir. Roja êk bi heyva êk ez dê li Moskow (Rusîe) bim. Ez dê li zankuê li wêrê xwînim.

Bi xatra te, Mamosta.

L.

Silav u rêz.

Cejina serê salê li te u ḧemîa u hevalên vê rojnama de pîruz bit. Silav bu wan ḧemî hevala. Ewan name bu vê rojname fer dikin u ewan dixwînin supas bu namêt wan. Bi rastî gelek dilxuşîa me ne. Bibure ez gelek mijîl im jiber hindê ez ne şêm pêjdarîa bi reporta pêjdar bim. Hîvî dikim hîn li min bibure. Supas carek dî. Serê sala hewe xêr u xuş dibin.

D.K.

Çawan î Şirîn.

Silav! Serê salê pîruz bit!
Hîvîa Xwidê seḧeta te baş e. Em gelek ji te xerîb bîn u hîvîa te dikîn.

Min ji kûllîê xilas kir u nuke ezê şul dikim u dixwînim bu masters. Min divêt ez biçim zankuek li Emrîke yan li Îmarata.

Keyfa min hat wextê min îmêla te dît.

N.Y.H.

---

## Seḧet Xuş!

ji meha burî:








---

Good Health



## Peyvêt Kurdî Berambera Inglîzî: Dawet




# Weddings

### BERAMBERÊ →

1 taxmek gerdenîa zêrrî
5 bîk u zava
6 kaẍeza mehrê
8 turr
11 kiras u fistan
12 xezîr
15 muzîkvan
16 dadwer
20 jin u mêr
21 reqisîn, bireqise
24 girtina jîanê
29 dîarî
31 serspî
34 suz
35 pare
39 mehir kirin, mehir bike
40 jin înan, jinê bîne / şî kirin, şî bike
41 miruv / xizim
42 nîşanî

### XWARÊ ↓

2 kartê de'wa dawetê
3 gul
4 mal
7 buxçik
9 jîan
10 xwarin, bixu
13 qaîşa lîra
14 mêhvan
17 Xwidê
18 cejina şîkirin
19 Bîkê diguhêzin!
22 xanî
23 gustîrk
25 pêk ve pîr bîn, pêk ve pîr bibe
26 meȟkeme
27 xastin, bixaze
28 dêr
30 xwazgînîa
32 xesî
33 îcaze
36 dezgir
37 xemilandin, bixemilîne
38 qeş




*[Bersiva vê Beramberê li guvara meha bêt dê ête belav kirin.]*



© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Fêrbîn u Fêrkirin ya Zimanê

Heker te divêt hindek têbînîa da zimana Inglîzî (yan Kurdî yan Frensî yan Almanî) fêr bî – yan fêr bikî – bila her heyv vê nivîsandinê bixwîne. Her heyv ez dê êk yan dû pêşnîara nivîsim u paşî tu dişêî bi kar bînî li fêrbîna xu yan li dersêt xu heker tu mamosta î.

**Peyva ji ber bike.** Wextê tu zimanekê bîanî dixwînî, pêtivî ye tu gelek peyva fêr bî. Çêtir e heker tu fêr dibî li têgehiştinekê li ser wê axiftinê u têgehandinê:



(1) Peyvêt wek êk u dû hilbijêre (bu numune, *fêqî – sêv, pirteqal, zebeş, muz, tirî*).
(2) Peyvêt nî li ser kaẍezêt biçîk yan li lîste binvîse. Ewan peyve ji ber bike.
(3) Pêyvêt kirîarî (firman / fî'el) zêde bike ku jêk tên (bu numune, *kirrîn, bikirre; firutin, bifiruşe; xwarin, bixu; şîştin, bişu; spî kirin, spî ke; înan, bîne; dan, bide; bi dilê [min] e; bi dilê [min] nîne*). Ewan jî ji ber bike.
(4) Ḧemî peyva bi kar bîne da rista bi mane bêjî (bu numune, *Min hindek sêv kirrîn. Wê tirî şîşt. Wan pirteqal spî kirin. Ez dê bu te hindek muza înim. Zebeş bi dilê me ye*).

| kî | çi | çawa |
|---|---|---|
| ez / min<br>tu / te<br>ew / wî<br>ew / wê<br>em / me<br>hîn / we<br>ew / wan | fêqî<br>sêv<br>pirteqal<br>zebeş<br>muz<br>tirî | kirrîn, bikirre<br>firutin, bifiruşe<br>xwarin, bixu<br>şîştin, bişu<br>spî kirin, spî ke<br>înan, bîne<br>dan, bide<br>bi dilê [min] e; bi dilê [min] nîne |

**Bixwîne.** Çîroka, nama, îmêla, micela, rojnama, webseyta, Incîlê u filan bixwîne da peyvêt xu qayim bikî u zêde bikî. Me'nêt peyva ji têgehandina wan fêr bibe jiberî tu ferhengekê seḧ kî. Hindek webseytêt Inglîzî eve ne:

Focus on the Family magazine - **http://www.focusonthefamily.com/**
Reader's Digest magazine - **http://www.rd.com/**
Time Magazine - **http://www.time.com/time/**
Fox news - **http://www.foxnews.com/**



**Tekstekê bixwîne u guhê xu bide**, bu numune Incîlê - **net.bible.org/bible.php?book=Mat&chapter=1**.

**Binvîse.** Peyvêt nî binvîse wextê tu guhê hevalêt xu dikî demê tu li gel wan diaxivî yan demê hevalêt te li gel êk u dû diaxivin. Rojnamekê biçîk li gel êkê Emrîkî binvîse da ew nivîsandinêt te dirist bikit.

**Ferhengê bi kar bîne.** Ferhenga Behdînî-Inglîzî anleyn bi kar bîne - **www.dcklci.com/dictionary** yan ferhenga Inglîzî-Inglîzî bi kar bîne - **http://nhd.heinle.com/home.aspx**.
Yan ferhengekê (kitêbekê) bi kar bîne.



© 2007 by Şirîn


© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

## Texmînê Bike!

© 2007 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- can — *beautiful*
- bajêr — *city*
- ne lêkdaî — *disorganized*
- çûn, biçe (herre) — *go (v)*
- bi tinê — *alone*

## Texmînê Bike!

© 2007 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- hîr — *petite (short person)*
- welat — *country*
- teĥil — *bitter*
- daxaz kirin, daxaz bike — *invite (v)*
- ba u herr (baruf) — *thunderstorm*

## Texmînê Bike!

© 2007 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- zîrek — *smart*
- şiqe — *apartment*
- xeter — *dangerous*
- rakirin, rake — *pick up (v)*
- tirrş — *sour*

## Texmînê Bike!

© 2007 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- Îbrahîm Tatlîs — *Ibrahim Tatlis (Turkish Kurdish singer)*
- Cizîrê — *Cizre (city in Turkey)*
- rez u pez — *farm and sheep*
- çalepka çûn, … biçe (herre) — *crawl (v)*
- spî — *white*

## Texmînê Bike!

© 2007 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- tema’ — *greedy*
- li hindav — *above*
- dahol u zirrna — *drum and Kurdish flute (at weddings)*
- veşartin, veşêre — *bury (v)*
- zivir — *rough*

## Texmînê Bike!

© 2007 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- li ber xu bi tinê — *selfish*
- zuzan — *picnic place (like a meadow)*
- werimî — *swollen*
- birrîn, bibirre — *cut (v)*
- risasî — *gray*

## Texmînê Bike!

© 2007 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- guh mezin — *big ear*
- bi rex ve — *beside / next to*
- pîvazî — *pink*
- şî kirin, şî bike — *get married [women] (v)*
- lêkdaî — *tidy*

## Texmînê Bike!

© 2007 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- bi sitar — *modest*
- li pêşîa — *in front of*
- şil — *wet*
- dil ketin, dil bikeve — *fall in love (v)*
- serbest — *capable and confident*

## Texmînê Bike!

© 2007 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- Melayê Cizîrî — *Melayae Jiziree (poet)*
- ji piş ve — *behind*
- qehweî — *brown*
- xeniqîn, bixeniqe — *drown (v)*
- baî u baruv — *hurricane*

# Elif Bê

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| a | ا ئا ـا ـا | j | ژ ژ ـژ ـژ | t | ت تـ ـتـ ـت |
| b | ب بـ ـبـ ـب | k | ك كـ ـكـ ـك | u | و ئو ـو ـو |
| c | ج جـ ـجـ ـج | l | ل لـ ـلـ ـل | û | وو ئوو ـوو ـوو |
| ç | چ چـ ـچـ ـچ | l | ڵ ڵـ ـڵـ ـڵ | wu, û | وو |
| d | د د ـد ـد | m | م مـ ـمـ ـم | v | ڤ ڤـ ـڤـ ـڤ |
| e | ه ئه ـه ـه | n | ن نـ ـنـ ـن | w | و و ـو ـو |
| ê | ێ ێـ ـێـ ـێ | o | ۆ ئۆ ـۆ ـۆ | x | خ خـ ـخـ ـخ |
| f | ف فـ ـفـ ـف | p | پ پـ ـپـ ـپ | ẍ | غ غـ ـغـ ـغ |
| g | گ گـ ـگـ ـگ | q | ق قـ ـقـ ـق | y | ی یـ ـیـ ـی |
| h | ھ ھـ ـھـ ـھ | r | ڕ ڕ ـڕ ـڕ | z | ز ز ـز ـز |
| ḧ | ح حـ ـحـ ـح | r | ر ر ـر ـر | ’ | ع عـ ـعـ ـع |
| i | ئـ ـئـ | s | س سـ ـسـ ـس | | |
| î | ی ئیـ ـیـ ـی | ş | ش شـ ـشـ ـش | | |

© by Şirîn 2003



© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Evîn

Ev wêne dirist kirin ji laê Gulzar Saliћ, 2005.





© 2007 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.